

ROJA NÛ

Kiriyariya Roja Nû; ji bona erdên Sûriye û Libnanê; 10 lîreyên Sûrî; ji bona welatên din 2 lîreyên inglîzî. Bihayê Hejmarekê: 10 Qemerî.

Dîwan û gerîndekariya Rojname: Bêrût-Birc; Weqif Tabet, Telefona Diwana: 74-04; Telefona Mala Xwediyê Roja Nû: 84-41. Edresa telg: Bêrût-Rojanû.

XWEDÎ Û GERÎNENDE : MÎR DR. KAMIRAN ALÎ BEDIR-XAN

CÊNG & SIYASET DEWRAN DEMINE GIRAN

Serfermandariya Elemanî

Tengiyê giran de ye. Çawan divê qiwetên eskerî bêne belav kirin, da ko midafîa Erdê Ewripayê pêk bê? Qiwetên ko ji bona midafîa Ewripayê, hewce ne çiqas in?

Di eniya rûsî de, qiwetên gaziyê ko Hitler pê piştîa yekîneyên perîşanbûyî xurt dikirin an ne mane an zehf hindik bûne. Zivistan çûyî destê Serdariyê de, qiwetîne teze hebûn û gava Ordiya Sor dirêjî Xarkovê dikir, General Von Mansteyn bi 20 firqeyên teze hati bû hawara Xarkovê.

Iro Destê Hitler de

Yekîneyîne wilo nînin. Di serê Kurskê de, Serdariya elemanî du seyêkên tangên xwe xisti bû şerî û dixwest pê di şerê Kurskê de serfiraz bibê; jê ne hat; û di şerên ko piştî ên Kurskê çêbûne, firqeyên elemanî ên zirhkîrî, zehf eşiyane û zererîne dijwar gihaye wan.

Tiştê ko iro ji destê Serfermandariya elemanî tê ev e; gava qiwetên di wê, yê ko di eniyekê de şer dikin, dikevin tengiyê, ji qadeke din esker dikîştine û tîne hawara qiweta cih lê tengbûyî; lêbelê pê qada din de sistî destpê dike.

Wextîne giran hatine û edî bi vê tedbîrê emel kirin, na keve dest. Elemanî bivê ne vê, der se eniyân, divê şer bikin, li Eniya-Rûsî, li Eniya-Behra-Spî û wextêkî nîzing de li Eniya Belqana an kî Ewriya-Roavayî. Ji xwe wilo dixwe ko di Sovyêtîstanê de, li hêla nîroyî, sekinandîna pêşveçûna qiwetên rûsî edî ji elemana naye.

Di Italyayê de

Rome hatiye îlan kirin bajarê berdayî, heye ko Hevalbend pê qail bibin—piştî ko hikûmeta Badoglyo şertên qanûnên nav nîjadî li ser wê pirsê anîne cih.

Wê gavê se firqeyên elemanî yê ko niho di Italya—Nîroyî de ne, divê dev ji çek û posatên xwe ên giran berdin û bê ko bi rêhesîna Romayê emel bikin xwe bi şûn da bikişînin, ber bi bakurî ve.

Ji xwe dîr an nîzing, ji bona elemana xeyra talyana ne maye. Roja ko ev tişt qiwimî û Italya ji destê elemana çû rewîşa elemana wê çî bibê?!

Ji bona parastîna sînorên Ewîstîriyayê ji hêla jêrîn ve 10 firqeyê divêtin, û ji bona vegirtîna dergêh û geliyên Elpên frensîzî ên roavayî 5 firqeyên din, 10 û heta 15 firqeyên elemanî divê herin Balqana û bîkewin şûna talyana.

Hejaba Erdê Balqana

Ji hêla pêş ve ajotîna şerî cîhar e û ev dergêhek ji dergêhên Ewripayê ye. Jê xuya dibe ko ji bona beşvanîya eniya xwe a roavayîyê wan 17 firqeyên he, bi şûn da bikişînin. Heke elemana ev tişt kir, ji alîkî hikm û te'sîra wan bi derbekê biheje û ji aliyê din, dergêh Ewripayê e bakurî, di pêşîya hevalbenda de, wê vebe; û bi vî tiştî qerargêhên noqavên elemanî yê Norveçîstanê ji dest derkevin. Fenlandiya di cih de dev ji şerî berde û parastîna eniya Leningradê, wê bibê tiştêkî bê îmkân.

FRENSE & HEVALBENDAN

Hemî Hikûmetan Komîta Frensîzî Venasî

LONDRE—R: Hikûmetên Emerîka, Bîrtanya—Mezin, Sovyetîstan, Brezilya, Kenada, Erjantîne Komîta Frensîzî a xelaskirîna Welêt venasiyê bi awakî resmî nas kiriyê ko ev Komîta nîmîndeyê Frensê ye û heta xelaskirîna erdê Frensê, Hikûmeta Frensê ew bi xwe ye.

LONDRE—Ji Bernê didin zanîn: Di Frensê de 250.000 frensîz, baş çek kîrî hêviya derketîna leşkerên Hevalbenda li Frensê ne. Du sed hezarên wan di çîya û darîstanan de xwe vedîşerîn.

WEŞINGTON—Mr. Rûzwelt gotiyê: 300.000 Eskerên Frensîzî, bi çekîne nû çek kîrî di vegirtîna Ewripayê de arîkariya me bikin.

DERBINE DIJWAR

Bombardîmana Erdê Germanîstanê Dom Dike

LONDRE—A.F.I. Refên bîrtanî û emerîkanî di nav heft rojên dawîn de jî, bê etlaî, hêjagêhên erdê Germanîstan û Italyayê, û yê erdên vegirtî bombardîman kirîne. Çekê Hevalbenda ê hevayî 3 cara li Berlînê xistine û zererîne dijwar gihandîne hêjagêhên payetextê elemanî.

Rapora gerîndekariya polîtê Berlînê elam dide ko bi derbên refên bîrtanî şeva şembê 5.680- peya hatîne kuştî. Şevadî refên bîrtanî ji nû ve zora xwe dane Berlînê û disa canê çend hezar peyan eşiyane. Bi bombardîmanên inglîzî û emerîkanî ên dawîn di Berlînê de 30.000 peya hatîne kuştî an brîndar bûne.

BER BI UKRANYAYÊ VE

Pêşveçûna Ordiya Sor Dom Dike

MOSKÛ—A.F.I. Di eniyên Xarkov û Brianskê de pêşveçûna Ordiya Sor dom dike. Leşkerên rûsî di roavayê Xarkovê de hero 10 û heta 15 kilomêtrîna ber ve tî, Xesarên elemana ecêb giran in.

MOSKÛ—R: Qiwetên Ordiya Sor di roavayê Stallînoyê de xetên elemana neqeb kirîne. Elemanî lez û bez gazîya xwe tînin û eskerîne teze tîxin meydana şerî bi qesda sekinandîna pêşveçûna sovyetî, ji aliyê din, leşkerên rûsî, di navbîra Vorosîlovgrad û Stallînoyê de ber êrîşake elemanî a xurt şêkandîne.

DI BILXARISTANÊ DE

Mirîna Kralê Bilxarîstanê, Giraniya Rewîşa Hundîrî

LONDRE—R: Kralê Bilxarîstanê êvara roja Şembê miriyê. Ew 49 salî bû.

LONDRE—R: Serekwezîrê Bilxarîstanê Filov, di radyoyê de elam daye ko Kral miriyê.

LONDRE—R: Kurê Kral, yê ko şeş salî ye, bi navê Simeon II. wê bikeve şûna bavê xwe û bibê Kralê Bilxarîstanê.

QAHIRE — Mirovdewletên bilxarîyên ko di serê kar de ne bi mirîna Kral Boris ketîne raman û teşxeleyîne giran, ji ber ko ew xweş dizanî ko millet ji wan hez nake û hikûmeta wan bi mirîna Kral yekcar bê dest û pê maye.

Xelkê Bilxarîstanê du bir in: 1.— Terefdarên rîya Stembulskî yê ko yekîtiya hemî slavên nîroyî ji xwe re kirîne armanc. 2.— Yê ko meyildarên bolsêvîka ne'û bi çavîne geş li Moskovayê dinêrin.

Gava Mr. Çorçîl re dane zanîn ko Kralê Bilxarîstanê miriyê wî got: Kralê bêbest.

WEŞINGTON—Kolonel Noks, Wezîrê emerîkanî 'ê behrî gotiyê ko destgehên emerîkanî niho hero çengkeştîyekê çêdikin.

TAGANROK KETIYE

AXA ROSTOVÊ JI OJMINA HATIYE PAQIJ KIRIN

Moskê — A.F.I. Serfermandariya sovyetî duhî êvarê danezana jêrîn belav keriyê, piştî şerêkî zor û xwendar leşkerên rûsî Taganrog vegirtiyê.

vayî, ji Hitler re 30 firqeyê eskerî divêtin.

Ma qiwetên elemanî ên li berdest çiqas in? Niho di Germanîstanê de firqeyên xeta şerî a paşî ko ne di eniyân de ne, nîne. 40 firqeyên elemanî yê ko di axa Frensê, Belçîka û Holendayê de qerargêh girtîne firqeyîne kêmesker in. Di Norveçîstanê de 10 û di Fenlandiyayê de jî 7 firqeyê eskerî hene.

Rojnameyên Sveçîstanê

Bawer dikin ko elemanî ji bê-

gaviyê wan 17 firqeyên he, bi şûn da bikişînin. Heke elemana ev tişt kir, ji alîkî hikm û te'sîra wan bi derbekê biheje û ji aliyê din, dergêh Ewripayê e bakurî, di pêşîya hevalbenda de, wê vebe; û bi vî tiştî qerargêhên noqavên elemanî yê Norveçîstanê ji dest derkevin. Fenlandiya di cih de dev ji şerî berde û parastîna eniya Leningradê, wê bibê tiştêkî bê îmkân.

Ev e halê ko Serdariya Elemanî iro tê de ye!

HINDISTAN

XELK û BAJARÊN DI WÊ

Londre— Wezaretê Bîrtanî a nûçedariyê elam dide: di nav deh salên dawîn de xelkê Hindîstanê 50 milyon zêdetir bûne. Iro rûniştîmanên Hindîstanê 388.997.955 kes in. 49 milyonên wan di bajar û şarîstanan de û ên mayî di gund û avahîgehan de rûdînin, 66 ojo hindî û 34 ojo misilman in. Di Hindîstanê de 2,703 bajar hene, Hindîstanî, avahîgeha ko rûniştîmanên di wê 5,000 in an hêj betir dihesibînin bajar.

Di erdê Hindîstanê de 655.886 gund hene. Rûniştîmanên her 58 bajarên Hindîstanê, ji 100.000 î betir in.

Weşington— Sala ko bê destgehên emerîkanî 2.000 woporên nû wê çekin.

Qiwetîne Emerîkanî

En Mezin Hatîne Ingilîstanê

LONDRE — Asoîetêd Pres elam dide ko bi hezaran eskerên emerîkanî, di nav wan de zehf balafirvan jî hene, li Behra Ellentîkê derbaz bûne û bi selamefî hatîne erdê Bîrtanya—Mezin.

PAŞVEÇÛNA JAPONA

ÇAVÊ WAN EDÎ ŞIKIYAYE

WEŞINGTON — Rojnameyên emerîkanî qala vegirtîna girava Kiskayê dikin û dibêjin. Beriya ko leşkerên me derkevin Kiskayê, eskerên japona jî mij û duman û tariya şevê istifade kirîne û terka Kiskayê dane û reviyane. Jê xuya dibe ko di eniya Pefîkkê de xwe bi şûn da kişandîna japona destpê kiriyê. Di giravên din de Japona heta eskerê xwe ê dawîn şerê me kirî bûn.

Wilo dixuye ko Japon edî li ber canê esker û çek û posatên xwe dikevin.

DEH TON BOMBE

NÛ-YORK — Kelehên Firok, bombeavêjên emerîkanî ên giran 10 ton, ango deh hezar kilo bombe hildigirin. Heta niha balafira dinyayê a xurtir 9 ton bombe hildigirt, bombeavêja inglîzî Lankester.

Weşington — Di nav 7 rojên dawîn de refên emerîkanî 300 balafirên japonî avêtîne erdê.

Montreal— R: Iro destgehên kenadî çêkirîna se vaporên mezin, her se bi hev re 30.000 ton, qedandîne û ew ketîne behrê.

CEZAYIR— Balafirvanên ko ji bombardîmana Focîyoyê—erdê talyana — vegeyîrane gotîne: pêtiyên egîr 900 mêtir bilind dibûn û ji 130 kilomêtrî dîrahtyê dihatin dîtin.

Weşington — Wezaretê emerîkanî a behrî dide zanîn: qiwetên emerîkanî ên behrî ji 2.240.000 serbend û deryavana bîhevkefî ne.

ZURIX — Şevdîn di bajarê Svîçerê Balê de îşaretê talukê hatiye dayîn.

BER BI STALINO & MARIOPOLË VE

MOSKÛ—R: Nûçeyên dawîn didin zanîn ko qiwetên rûsî niho rast bi rast zora xwe didin bajarên Stalino û Mariopolë.
 CEZAYIR—A.F.I. Refên brîtanî û emerîkanî hêjagehên peravên Yewnanîstanê ên roavayî bombardîman kirine.
 CEZAYIR—R: Zirehpâşên brîtanî Rodney, Nelson, qriwazora brîtanî Orien û 9 destriyoran dâhî betariyeyên Reçiyoyê bi serdestî bombardîman kirine.

DI TAXA KURDAN DE

Di bîst û sisê vê mehê de, roja duşemê, piştî nîvro, li taxa Kurdan, li bangayê (Selahedin—Kurdistan) ê şabnetek mezin çêbû: xortên kurd, ji nalbên kurdên Sûrî ra dawetek heja çêkirin. Di vê dawetê de hemî nalbên Kurd, û mezin û xwendayên kurdên Şamê dihatin dîtin. Xortan ji can û dil mevanê xwe istiqbal dikirin. Gerîndeyê xortan M. Mehemed Me-

tinî nutqek bi kurdî û serekê civata şagirtan M. İsmet Şerîf nutqek bi zmanê erebî gotin. Mana nutqê wan nêzîkî hev bûn... Her du xortan jî nalbên xwe bi germiya dilên xwe pîroz dikirin û ji wan bi navê xortan xebatên nejadî hevî dikirin. Nalbê deşta Sîrûcê cenabê Mustafa Şahîn beg jî bi navê nalban kêfa xwe ji wan re anî û çend şîretê bavani li wan kirin.

Paşê jî nalban her yekî, ji bangayê xortan re ev qas pere pêşkêş kirin:

Mirza Hesen axa Haco nalbê	Cezîrê sed (100) lire Sûrî
» Seîd » Deqorî »	» sed (100) » »
» Qedrî beg Cemîl Paşa »	» sed (100) » »
» Mustafa » Şahîn nalbê Sirocê pence (50) »	» » » »
» Seîd » İshaq » Cezîrê »	» (50) » »
» Şexo axa nalbê Çiyayê Kurd »	» (50) » »
» Faîq » » » »	» (50) » »
» Cemîl » » » »	» (25) » »
» Mehemed Filtz ji axên Çiyayê Kurd (10) »	» » » »

Paşê şîr-berf «glas» hate pêşkêşkirin; û mevanan bi dilxweşî û rûgeştî xatir ji xortan xwestin. Xortan jî bi yek dengî digotin; Bi-ji Kurd... Bîjî Mezinên Kurd.

Mala Ebdurehman paşa erdeklî heja ji xortan re pêşkêş kirin. Kurê paşê Mirza Hesen beg bi xwe çû ziyareta xortan û ji wan re sê zêrên İngîlîzî jî diyarî kir. Her bîjî.

KEZAL

Navê te filan û bêvan
 Sing û berê xelkê delal
 Bûne buxçikê gul û sévan
 Xwez ya min bi wê hingê
 Bisk û simbêlê min û te
 Li hev û du bibin mêvan.
 Mi te ne di fro du ro
 Derî veke wer hinduro
 Xwez ya min bi wê saetê
 Bi wê gavê
 Ez bêm keçê, tu bê kuroll...
 Mi te ne di fro şeq e
 Bejnîzîravê te çav reş e
 Çi wextê ko min te ne di
 Fincana jehrê bi min xweş e.
 Mi te di bû l' ser xanika
 Mi ban te kir bi tillika
 Mi go were keçê dîn e
 Ramûsana xweş e, bi dizika...
 Ez kewek im, j' kewê tal im
 Wêz l' ser xanikê mala bavê
 Te dinalim
 Xelk hewceyê malê dinyê
 Wêz hevceyê çavê xal im.
 Ez kewek im, j' kewê şîm im
 L' ser xanikê mala bavê
 Te dixwînim
 Wêz çavê xwe li her wextê
 Qonaş, qonaş digêrnim
 Yek li wê qamê, li wê tîmêlê
 Qe na bînim.
 Tu li ser bana çî digêrî?...
 Penya çîzmê, me ke herî
 Tu li fermana serê xwe û
 Li serê min digêrî?...
 Mi diti bû, li bîne sévê
 Çixare vexwâr bi serê lêvê
 Mi çî kiri bû, tû enîrî?
 Tu xeyidî, bi min na xêvê.
 Bejna zirav mi rahişte
 Jî kember kirî, bidim piştê
 Mala fetan û fezulê bişewite
 Qe ne hiştin, ez tîr rûnim
 Li tenîştê...
 Rîya, Samê kursî mîrî
 Her çî hat û min lê pîrî
 J' mi re gotin delalê te bi çî nîgan e?

Mi got; bi kirasê kitan
 Bi terpiyê nîfsî.

Ez li hember, tu di hember:
 Xwedan barî misk û ember
 Heyfa ko li wê heyfê tê
 Keçîk gewr e, lawîk esmer.

Mi te di bû, li ber sefê
 Tîzbî qet'ya kete kefê
 Xelk ewdalê malê dinyê
 Ez ewdala çoka rastê,
 L'bin Mishefê...

Wêz nexweş im, ta digirin
 Roj bi rojê xirabîrî im
 Heke carek te di bînim
 Ji doh û pêr, ez çetir im.

Wêz nexweş im, were ser min
 Guhê lihêfê hilde, tîkev her min
 Eger dê û bavê min gotin.
 Kiyê ne kiyê?...
 Ezê bêjim:

Hekîmê Luqman hatê ser maia,
 Navbira min û te dîwar e
 Pihnek lêxe, bîne xware
 Heke dê û bavê min gotin;
 Kiyê ne kiyê?
 Ezê bêjim: Yabû!... Yadê!..
 Şev reş e, diz hezar in.

SUBHIYÊ DIYARBEKÎ

CARINA

Em ji bîra dikin ko payetex-
 tîn dewletên Ewropayê ev in: pay-
 textê Frênsê Paris, yê İngîlistanê
 Londre, yê Sovyetîstanê Moskû, yê
 Germanîstanê Berlîn, yê Polonya-
 yê Wersovî, yê Italyayê Rome, yê
 Spanyayê Madrid, yê Fendlandayê
 Helsingkî, yê Norvecîstanê Oslo, yê
 Sweçîstanê Stokholm, yê Holenda-
 yê Lahê, yê Belçîkayê Bruksel, yê
 Danîmarkayê Kopenhagen, yê Çe-
 koslovakyayê Prag, yê Mecarîstanê
 Budapest, yê Romanyayê Bukreş,
 yê Yugoslavyayê Belgrad, yê Svi-
 çreyê Berin, yê Bîlkarîstanê Sofye,
 û yê Portîgalê Lizboa.

MIREKA CIHANE

MIREKA CIHANÊ MIREKA WENEYÊN ŞER Û AŞTIYÊ

EVE EMERIKE

Herwekî erdê Emerîkayê gelek fireh û mezin e, heke emerîkaniyê ko di San Fransiskoyê de rûniştiye — li peravên Pesîfîkê — xwest bi yekî din ko di Nû-Yorkê de — li peravên Atlantîkê — xwedîkar e baxê ve, divê rîya 3.000 mîlan here. Lêbelê her çend jî erdê Emerîkayê hinde fireh e, û xelkên welatê jorîn, yên jorîn, yên erdên rohelaî ên roavayî

sekîni ne. Di sala 1940-f de 12.000 balafir ji wan stasyonan bi hewa ketine û kaxet, pakêt û rêwîngî neqil kirine.

Li wê salê sê mîlyon kilo pakêt û reşbelek û mîlyonek û nîv peya bi balafira hatine guhaztîn.

Miletêkî Ciwan

Di nav mîletên dinyayê ên mezintir de yê ciwantir mîletê emerîkayê ye.



Balsfireke Emerîkanî a Rêwîngîyan; Bajar û Şarîstanên Emerîkayê Ne Bi Tenê Bi Rê û Rêhesînên Çak Lê Bi Rîyên Hewayî Jî Pev Re Girêdayî Ne.

yên bakurî ên nîroyî carina di bînin, emerîkanî hemî bîrewer in ko welatê wan, zmanê wan, al û qedera wan yek e, û ji hev û du gelek hez dikin, qedrê hev û du digirin û dema zehmetê de, di tengiyê de, xebat û dil û gotina xwe dikin yek û bi kêrî hev tên.

Di dora ala emerîkanî de 140 mîlyon emerîkanî digihin hev û du, û ji bona azahî û serbestiya welatê xwe her fidakariyê dikin.

Ji aliye din, her wekî telefon, û telegrafên Emerîkayê zehf xweş diguixîlin, xelk dikarin di nav du sê deqîqan de — ji hev û du çî-

Wexta berî da kes ne dizanî bû ko di piştî behran de erdine mezin hene. Peyayekî hiyyar û şeh-reza Krîstof Kolomb sala 1492-an de erdê Emerîkayê keşîf kir. Ji İngîlistanê û ji welatên din zehf peyayên heja û serbest, yên ko jî zîlm û l'adayên axa, beg û mîran bi gotinekê jî zorkerîya mezinan aciz bûbûn, dev ji mal û welatê xwe berdane û hatine Emerîkayê, tede gund û bajar avakirine, bi zanîn û hêjabûna xwe, ji kaniyên Emerîkayê ên tîrdewlemendî istî-fade kirine, pêş ve ketine. Xelk hemî hînfî xwendin û nivîsandîne



Qey Bergehek Ji Welatê Me ê Delal Kurdîstanê: Şivan, Seh û Pezên Di Wî.

qas jî dûr bin — bi telefonê xeber bidin û telegrafa ko hatiye şandin, di nav saetê de digehe xwedîyan. Reşbelekên ko di balafira de tîne rêkîrin di nav şev û rojê de ji San Fransiskoyê tîne Nû-Yorkê.

o o o

Lê demin hene ko îş bi tele- fon, tele raf û reşbelekên nayin qedandin û mirov hewcedarî dîtina, dê û bav, dotmam û pîsmam, an hevalê xwe ye. Ji rêhesin, omnîbus û waporan pê ve 2.500 stasyo- nên balafirên heviya rêwîngîyan

bûne, dibistan, medreseyine mezin çêkirine, febrîqe, karxane, destgeh wapor ava kirine, mîlet hemî hî- nî heqê xebat, azahî û serbestiya xwe bûye, adetên neçak ji ortê rakirine, û her kes seh kir ko hê- jabûn, gehrezayî qedr û şerf bi xebat, bi ilim, bi tevger, terbiye û exlaqên baş girêdayî ne. «Tu bîxe- bite ez bîxwim, ji ber ko ez mezinê te me, ez axa, beg û mîrê te me, an tu bîxebete û bide min û ezê jibona te dia bikim, ne tu rêz û rêzîk in

LE JOUR NOUVEAU

Direction: Beyrouth Wakfs Tabet
Place des Canons Tél. 74-04 et 84-41

QUOTIDIEN KURDE
Directeur - Propriétaire: EMLIR DR. KAMURAN AALI BEDIR KHAN

Le Numéro 10 P.L.S. - Abonnement
Syrie-Liban 10 L.L.S. Etranger 2 L. Stg.

Vers la Victoire

CHRONIQUE HEBDOMADAIRE
DE LA GUERRE

La semaine qui vient de s'écouler est riche en événements; la reprise de Kharkov, la reconnaissance en termes divers du Comité Français de la Libération par la Russie, les États-Unis, l'Angleterre, le Brésil et la Chine, et la décision largement diffusée, prise au cours des conférences de Québec, de ne plus considérer Hitler comme le seul ennemi à abattre immédiatement mais de mener en même temps l'offensive du côté de la Birmanie: le choix inattendu pour ce secteur de Lord MOUNTBATTEN, le créateur des Commandos, peut évidemment paraître significatif.

La reconnaissance du Comité Français n'a pas causé de vraie surprise: elle était dans l'air depuis quelque temps déjà et l'on sentait que le faisceau de vraies sympathies dont il était l'objet devait rapidement l'emporter sur les hésitations politiques de quelques nations.

Le paradoxe est enfin supprimé d'une communion de fait entre la majorité des Français de France et son Comité directeur d'Alger, non consacrée formellement par les grandes puissances démocratiques: la France de l'extérieur est désormais, selon l'esprit de la note russe, reconnue comme étant le prolongement de la France Combattante de l'intérieur.

Ainsi, pas à pas, grâce à la détermination inébranlable des Grands Chefs Français dont le clair dessein s'est imposé au monde dès le début, la France de plus en plus retrouvée « remonte la pente de l'abîme ».

Mais c'est en Russie que se passent actuellement les faits les plus déterminants; de Briansk à Taganrog les Allemands reculent sous les coups de l'Armée Rouge. Après la reprise de Kharkov qui, sans parler de l'effet moral, les prive d'un centre vital de communications et de ravitaillement, les Russes ont continué à progresser vers l'Ouest où ils sont déjà à 160 Kms de la capitale de l'Ukraine et plus au Sud ont défoncé les lignes, ennemies dans le secteur de Mius. Déjà la voie ferrée Poltava - Kiev est menacée et d'après les critiques militaires le contrôle de cette voie par les Russes signifierait que toute l'Ukraine elle-même serait très gravement menacée. Les deux bases de Poltova et de Krasnograd sont près d'être encerclées.

Par ailleurs, la nomination de Himmler aux fonctions de ministre de l'Intérieur en Allemagne, éclaire d'un jour nouveau la situation dans le Reich: les désastres du front de l'Est ne peuvent plus être camouflés, l'été surtout, en succès de défense élastique. La masse bouge et elle bouge aussi dans les pays qui semblaient le mieux contrôlés par les Allemands; au Danemark c'est la révolution et en Bulgarie le roi Boris vient de succomber: défaillances cardiaques, disent les radios de l'axe, assassinat politique disent les autres, et cette dernière version est la plus probable.

Il n'est pas aux abois...

D.

UNE PETITE NATION: UN ÉTAT MODÈLE

LE SORT DE LA SLOVAQUIE

La Slovaquie est aussi devenue un protectorat, quand même sous le prétexte d'être un « Etat libre ». Elle a été assujettie à une oppression très similaire à celle de la Bohême et de la Moravie. La principale autorité du pays n'est point la poignée de quislings qui forment le gouvernement slovaque, mais le Ministre allemand en Slovaquie et son veto suffit pour empêcher les décisions mêmes unanimes du « gouvernement » et du « parlement » fantoche, d'avoir force de loi. L'exploitation économique de la Slovaquie est aussi totale que celle du « Protectorat ». Bratislava, la capitale, est maintenant presque totalement allemande. Les colons allemands qui ont pénétré en Slovaquie en dizaines de milliers ont les premiers droits sur les produits alimentaires et leurs enfants sont installés dans les écoles slovaques. La culture slovaque a subi une éclipse. Les bibliothèques ont subi une purge barbare. Les remarquables progrès sociaux de la République Tchécoslovaque, sont arrêtés. L'ennemi de la vie a baisé. Les grèves sont à l'ordre du jour et leur répression les unes après les autres donne l'occasion à la brutalité du conquérant de s'exercer.



LA RENAISSANCE DE LA TCHECOSLOVAQUIE

L'occupation nazie n'a cependant pas aboli l'existence légale de la Tchécoslovaquie. Pendant que ses citoyens s'évadent à l'étranger pour s'organiser sous la conduite du Président Benes (lire: Bénèch) et les nations Unies continuent à reconnaître la Tchécoslovaquie. Le nouveau gouvernement tchécoslovaque en exil fut constitué à Londres. Des milliers de Tchécoslovaques participent au commun effort pour gagner la guerre, des milliers d'autres font service dans l'armée tchécoslovaque qui s'est couverte de gloire, en Pologne, en France, dans le Moyen-Orient, dans la guerre aérienne et dans l'Union Soviétique. Dans le pays, le peuple tchécoslovaque continue sa lutte acharnée et sanglante pour sa libération.

L'ARMÉE TCHECOSLOVAQUE

L'armée tchécoslovaque reconstituée maintenant à l'étranger, a deux nobles traditions. La première est celle de l'armée populaire du XVIe siècle, sous le commandement de Zizka (lire: Jizka).

Elait un original, un soldat et un stratège. Ses chars blindés furent les précurseurs des tanks actuels. De son temps, également, les Tchèques furent les premiers à utiliser les canons lourds appelés « houfnice », lire: houfnitsc, les obusiers dont le nom anglais « howitzers » descend du mot tchèque, ainsi que le nom d'une autre arme, du pistolet, est dérivé du mot tchèque « pistala » (lire: pichyala), le siflet; d'après la forme de cette arme. La seconde tradition est celle des légionnaires de la guerre 1914-1918. Ils étaient au nombre de 150.000 et pour la plupart, avaient passé de l'armée autrichienne pour rejoindre les armées alliées. Ils combattirent comme unités indépendantes en France, en Italie et en Sibérie leur expédition hors de Russie, de la Volga à Vladivostok, constitue un des exploits militaires des plus extraordinaires de la dernière guerre.

La première République Tchécoslovaque consacra tous ses soins à son armée, mais l'accord de Munich, auquel elle n'a pris part et qui constituait pour elle un simple décalé des quatre Grandes Puissances de l'Europe Centrale et Occidentale, l'obligea à tout abandonner sans avoir combattu.

La nouvelle armée tchécoslovaque de la guerre actuelle, dont le recrutement s'est effectué parmi les Tchécoslovaques qui habitaient l'Europe Occidentale et parmi les exilés qui ont réussi à s'évader de leur pays, a ses gloires et ses cicatrices. Ses soldats sont des pionniers combattants, animés d'une foi commune dans un monde nouveau et représentent un facteur actif de la seule assurance de liberté organisée que les démocrates acceptent universellement.

L'ECONOMIE TCHECOSLOVAQUE

Il serait facile de transformer les sobres réalités de la finance et du commerce tchécoslovaques en une histoire romantée, qui serait excusable car l'évolution tchécoslovaque accomplie sans réclame — contrairement aux méthodes employées par d'autres pays — contient des éléments d'énergie et d'application qui ont impressionné le monde.

L'équilibre de l'activité nationale tchécoslovaque, à savoir un tiers pour l'agriculture, un tiers pour l'industrie et le reste pour le commerce et d'autres services, semblait le système idéal pour un petit pays.

En 1919, une loi extrêmement sage prévoyait la répartition dans une période de 5 ans de 1.000.000 d'hectares entre des petits fermiers et des paysans sans terre. Il y eut aussi d'autres décisions importantes, telles par exemple, la reconstruction de Bratislava (lire: Bratyslava), la capitale de la Slovaquie, en tant que port danubien, destinée à l'acheminement des produits slovaques vers le reste du monde; une politique d'accords douaniers qui réduisait les droits de douane de moitié et une ferme confiance dans l'avenir, confiance très justifiée que faisaient naître les progrès accomplis particulièrement dans l'éducation et le bien-être social.

De 1919 à 1937, la population passa de 13.528.000 à 15.247.000 soit une progression de 12,7 pour cent en 18 ans. En 1921, il y avait 19.242 écoles, et 24.147 en 1935. ce qui représente une augmentation de 25 pour cent en 14 ans. Le même esprit progressif fit que la longueur totale des voies ferrées augmenta de 18.401 kilomètres en 1918 à 21.308 en 1935: une amélioration de 15,8 pour cent en 17 ans.

On peut estimer que la richesse nationale de la Tchécoslovaquie s'élevait à 250 milliards de couronnes Tchécoslovaques (environ 12.500 millions livres syro-libanaises) avant que le désastre de Munich ne vienne

POÈME KURDE

CHAUDE COMME MON COEUR

Hier,
En marchant à côté de vous,
Vous me disiez des mots doux,
Des mots tendres,
Des mots charmants
J'ai cru être l'amant
D'une déesse
Qui dans la paresse
De monter au ciel,
Daignait s'occuper d'un être
Terrestre.
Votre visage,
Plus éblouissant
Que le rivage
D'un monde inconnu
Au coucher du soleil,
Me charmait,
O femme d'une terre chaude
Comme mon cœur
Etes-vous la soeur
De l'amour?
Je vois encore vos lèvres rouges
Qui bougent
Comme une flamme
Dans un sanctuaire.
L'air
De votre voix
Bénie comme une prière
A guéri mes blessures.
Comme je suis ravi
Oh femme plus belle que la vie.

REGARD DE LA LUNE

Regarde-moi sans rien dire
C'est ainsi que regarde ma brune,
Le soleil et la lune.
Comme la rose son parfum
As-tu un mot doux pour moi,
Pour me couronner de joie?
Tu sais que tu es belle
Mais pourtant je veux te le dire
Ne fusse que pour te faire rire.
Regarde-moi sans rien dire
C'est ainsi que regarde ma brune,
Le soleil et la lune.

DR. BEDIR KHAN

LA PRESSE KURDE

Nous signalons, à nos lecteurs s'intéressant au mouvement culturel KURDE, les journaux et périodiques kurdes suivants:

- RIYA TATÉ** organe des Kurdes de l'U.R.S.S. paraissant à Erivan.
- GALAWÉJ** la plus grande revue littéraire kurde paraît chaque mois à Bagdad, avec 80 à 100 pages de texte hebdomadaire politique et littéraire paraissant à Souleimanié.
- JIJAN** revue littéraire bi-mensuelle paraissant à Damas. Textes kurdes et français.
- HAWAR** Revue mensuelle illustrée, paraissant à Damas.

disposer l'actif national. En 1937, le revenu national était de 67 milliards de couronnes (4.500 millions livres syro-libanaises environ). En 1937 aussi, la dernière année de l'existence normale de la République le chiffre des exportations s'approcha de 12 milliards de couronnes (600 millions livres syro-libanaises environ) La Tchécoslovaquie exportait surtout la verrerie, la porcelaine, les textiles et le sucre aux Etats du Levant.

LA TCHECOSLOVAQUIE—ÉTAT MODÈLE DE L'UNE PETITE NATION

La République Tchécoslovaque représente ainsi un Etat modèle d'une petite nation patriote et démocratique. Son peuple était toujours et l'est toujours, pris de la liberté. La Tchécoslovaquie renâtrera pour le bonheur de son peuple et pour le bien du monde entier.

Strana Kurdi

**HECÎ MÛSA BEGË
XWËTÎ Û GULË**

Eman Gulë, ermeniyê.

Tu kerem ke ji ber tavê wer ber siyê.

Gula Narîn, axçika fila, hev de berda ji teşiyê.

Ceng bi çîne, neqşê lengeriyê, sifet pa nê, wek sênîyê.

Tu kerem ke elb û eyar—şîrê xwe hilîne, da em herin bêriyê.

Hecî Mûsa Begê zirav siwar bû li xam ciwanîyê, dike Gula Narîn, axçika fila, qîza Reîsê Dêra, bèn ser dîne sulmaniyê.

Gulê bankir: Eman Bego, mi li diyara diyarê ay zemana; li min û li va dena li va dewrana, sûnd xwarî me, bi sûnda keşakî û du metrana, heta tu goştê canê mi ranekê bi wa dirana, heta tu hesiyê canê mi ne firîne, bi çakûça û kerbetana, tu car nabim jina mêrkê li sulmana.

Eman Gulê, mal şewitiyê, mi li diyara diyarê Abyemana, koç û keriyê me, ne çû zozana, ramîsanê Gula Narîn, axçika fila, li cem dilê min, pir xwestir e, ji ramîsanê heft keçikê musulmana.

Gulê ban kir: eman Bego, Dêra bavê min pir mezin e. Keşe û rehab û metran lê rûniştin ser û bin e. Sûnd xwarî me tu car ji mêrkê musulman ra ne bûm jin e.

Ax lê eman, lê, lê Gulê, lê axçikê ermeniyê, dil kafirê, tu li ba dilê mi sifet sorê, fena çîrê.

Te gulikê qezê berda ser qonderê, Gula Narîn meşîya li ser pirê.

Hecî Mûsa Begê zirav bi qevda şwir girt û xar dibirê.

Gulê ban kir: eman Bego, tu qe mê, û xwe me eşîne, ezê dengêki dudo li keşa û li metrana biqirînim, tu musulman e, ez file me, tiştêki, dîne min û te tev tunîne.

Ezê daw û delinkê xwe hilkişînim. Rêka qoce Stanbûlê, bigirim bi ca'dînim, textê sultan Evdulhemîd, di bin da bihejînim, perda sultan Evdulhemîd biqetînim. Kêra qelemteragê ji bêriya xwe bi derxînim, ezê bi canê xwe ê gewrxînim, pêlê xwîne bi ser textê sultan Evdulhemîd da birjînim.

Heft duwelê ecnebî û dewleta Ali Osman bi xwe û te bihesnînim.

Kirasekî bê pêsir, bi ser bejna xwe û te da tev de dînim, belkî Sultan Evdulhemîd hegê mi ji te bistîne.

Gulê ban kir: eman Bego ezê ban kim dengêki dudo ban rahîba ban keşa kim, mal şewityo, ma tu musulman e ez file me,—ez dikim û nakim xwe ji destê te pak na-

kim. Sûnd xwarî me bi Incîla İsa û Mûsa, ez tucar terka dîne İsa nakim mehra mêrkê musulman bi eşhedê bi şefaeta Muhemed, li ser xwe qebûl nakim, zimanê Katolî û Ermeniya li ser xwe zêde nakim, ezê ruhê xwe li ber dîne bavê xwe can fîda kim.

Hecî Mûsa Begê bankir: eman Gulê, ew sibe ye, xweş sibe ve; tu kerem ke, ezê biskê werim hînda te ye, ezê maç kim cotê memkê te ye, mirin heq e, qebra tari mala me ye. Gulê bankir. eman Bego, te wer mebeje, ji dîne bavê mi ra pir xerab e, keşe rabû ji ber rahîb e, heta ez li darê dinyayê sax bim, cotê memkê mi we ji Miqsiyê lawê apê di mi ra be.

Hecî Mûsa Begê ban kir: eman Gulê tu wer mebeje, û me xingire, heqî cara ez te dibînim, dilê min mezin dibe, dibe gir e, ez bi mêraniyê ji Miqsiyê lawê apê te mêrtir im, bi xurt bûnê jê xurt tir im, mi wellehî, qesem kire, eger tu qîz be, eger tu jin be, eger tu bi mêr be, eger tu bi mehîr be, illim ezê şevkê bi destê zorê li te bihêwirim.

Gulê ban kir: eman Bego tu bes, li mi de, ez gune me, ez Gula Narîn, qîza reîsê Dêrê, ez bi xwe me, tu musulman e tu begler e, ez axçik im, ez file me, ez hesîyaki heram im.

Li nav cimaeta musulmana, ji te ra ser hevde me.

Ez ji dîna, rebena dîne bavê xwe me.

Hecî Mûsa Begê ban kir: eman Gulê, roja me hilatî qirî perî, şewqê xwe da qesra bavê Gula Narîn da, qapikê her çar derî, eman Gulê, mal şewityê, tu ne biçûk e, ne mezin e, tu nuh kemilî, heger tu file ye, heger tu çîla ye, mi tu qebûl kirî; şev û rojê Xwedê bist û çar saet in, mi seba Gula Narîn, miraq kirî.

Gulê ban kir: eman Bego, tu bibêje falde nake, gotina mêrkê musulman, li cem min pere nake, mi ji tera ne go: Sûnd xwarime, ez tu cara terka dîne İsa nakim, mehra mêrkê musulman, li ser xwe qebûl nakim, ruyê xwe ji hizûra bav û birê xwe reş nakim.

Hecî Mûsa Begê bankir: eman Gulê, ew havin e xweş havin e. Hêviya xwe dikim ji rebê jorin e, ezê carkê, carkê te bi tenê, li baxçê bavê te bibînim, tu zanî, ez Mûsa Begê xwêti, Baxê welatê jorin im, tu zanî ezê destê xwe li qevda xelef sorê xînim, ezê xerzaniyê ji ber fota ecem de bikîşînim, ezê Guliyê 'a sor û sosinî, li destê xwe bigerînim, temamê fila, eşîra bavê te bèn, nikanin te ji destê mi biderxînim.

PÛJINÂN DINYAYÊ

CENG & RAHETI



Leşkerên Ordîya Britanî A Heştan Dikevin Mesînayê. Ev Eskerên He Skoç In û Mîna Kurdan Ji Dahol û Zirnê Hezî Dikin.




Peyadeyên Ordîya Sor Balafireke Dijmin Didin Ber Derbên Tîfingên xwe.

Gulê ban kir: Eman Bego, dêra bavê mi biçûk e, keşe û rehab û metran lê rûniştin sera sûk e. Sûndxwarî me, bi Incîla İsa û Mûsa, ji mêrkê musulman ra na bim bûk e.

Sibe bû, bira ne hata, bîna bayê her li newela, sibe bû Hec Mûsa Begê zirav, sekîni li orta mala, carkê nêrî Gula Narîn qufik

hilanî, ji kûçikê bavê xwe ra, çû hinara Hecî Mûsa Begê zirav, serê xwe girêda bi yazmakê û çar desmala, mirê zirav çente dagirt ji derbê enextara. Hêdî, hêdî meşîya nava dara. Guliyê Gula narîn, li destê xwe gerandî weke carra; berê Gulê da çem û çeta û qilicê behra. EBDILHADÎ MIHEMED



DEPOXANEKE ÎNGİLİZÎ A MEZIN JI BONA BOMBAYÊN BALAFIRAN.

Şin

Li ser giyanê MEHEMEDÊ SEYDA

Buhara umrê ciwanî bê gul û çiçek hat İsal. Movika dara xortanî ne bîşkuvî bûye zewal...

Ev çî xewa yekcarî bû ku destê te ji me qetand, Xwezî te zanî ba xwezî, li dû em çend bûn melal.

Ji bo giyanê te çîqas şin û girî bit hêja ye, Muxabîna ciwanîyê, bejin zirav, xortê delal.

Wefakarê hevalên xwe, welat-parêz bi rastî, Di dîne de min hêj ne dit, ji te çêtir, qencîr heval.

Selavê min ji dûr li gorîna te û çayê Cûdî Û ji zemzem pîrestêştir çemê Dîclê ava zela...

Heger tu hesretkêşê bav û biran î di bin axê, Ez ji li ser dîne tenha mame, ji dil tîn nale nal...

Bira çavê te li dîne ne zivire, zînhar, bira! Gîş fanî ye, bê dawî ye, poşman me be bavê Cemal.

Heger carekê tu mirî rojê sed car em dimirin, Ji her cewrên çerxa felek, êdî em bûne gê û lal...

Ev jiyînê derbiderî mirin sedcar jê çêtir e, Esaret û bendeganî milletê me kir bêmeçal...

Heke tu kani bi bi navê xortan ji Xwedê bipîrs, Bi gîlî û bi gozînan bibêjê edî bes e ev hal.

QEDRÎ CAN